



coronahilat

fanzîna ji fotografîyê dinizile

HEJMAR: 15, NÎSAN 2020

Erol Şaybak ✍

Ivor Prickett 📷 🗨

Ferit Fikret ✍

Yousuf Karsh 📷

Arina Voronova 📷

Mehê carê derdikevim. Kesên dixwazin fotograf û nivîsên wan ên li ser fotografîyê di ser min re belav bin, dikarin wan ji flashhilat@gmail.com re bişînin.

Edîtor: Omer Faruk Baran

HEJMAR: 15, Nîsan 2020

Jiber talûkeyên vîrusa korona çêkirine ew hejmara di destê te de bi tenê bi awayekî dijîtal hatiye belavkirin. Piştî mizgîn hat û rojên bi vîrusa korona bi dawî bûn, wê ji vê hejmarê 40 sûret werin çapkirin û hin ji wan li bankên parkên Riha, Dîyarbekir û Mêrdînê werin danîn.

 **flashhilat**  **flashhilat**  **flashhilat.fanzin**

SILAVA EDÎTOR



DEMA BIRCÊN DIYARBEKIRÊ KOÇ KIRIN

Erol Şaybak

“Bila bircên Amedê bibêjin çîroka me, qîr û qetran e...”

Ji straneka Mirady – ‘Xenîm’

Ji bo Mizgîn Arslan Şaybak...

Gelo we hay jê heye kevirên bircên Diyarbekirê, bi şev dibin qijikên reş û yeko yeko ji welatê me koç dikin? Texmîn nakim we hay jê hebe. Di şeveka sayî da, heke we serê xwe ji mobaylfonên xwe rakiriba, li ber ronahiya heyveronê belkî we bidîta kevirê mezîniyê bircê ji nişkê ve dibe qijik û ber bi Qerejdaxê ve pirr, difire diçe. Xwînerên min ên sadiq î baldar dê aniha bizanin ka ez behsa çi dikim û dest bavêjin telefon, kompîter an jî tabletên xwe, DMyekê, menşinekê an jî maîlekê bo min binivîsin; “waa, erê xebera te ye”, dê bibêjine min, “eyn wekî te gotî, şeva yekşem an duşem an jî nehşemê li dor bedenê, li hindava Fîsqayayê an jî li serana zeviyeka Hewselê min jî dît kevirêk bû

qijik”, ez ê jî xembariya xwe ya ji ber koçberiya
Bircên Diyarbekirê bikim cewabek û bidime wan.

Cara ewil du sal berê min dît nîşevê, qijikek reş î
qetranî per û baskên xwe yên nebixêr li hev dide û
bi qajevajeka dirrindane ber bi rojavayê Çemê
Dîclê ve difire. Çar bihûst bejn lê ye, navmilên wî
ewqas qelew in ji navdera malê derbas nabin, min
heyat-ul ‘umr teyr û tiyureka wisa mezin nediye.
Min dizanî kes pûtê bi gotinên min nade heke ez di
nav şer û qiyametê da behsa qijikên bêdelîl û koça
wan ya badilhewa bikim, nexasim jî rayedarên vî
bajarî; paytextê derdemendan. Bi ser de belkî
mu’emeleya dînan li min bikin. Piştî du salan, roja
îro, axir ez xweş pê qaneh bûme ku ew tiştên wisa
nîvê şevê dibin qijikên reş û difirin, kevirên bircên
bajarê me ne. Weyla bajoaro belengazo!

Heçî xudanmelheze ye, tekamula giyaneweran
kêm zêde dizane û baweriyê pê nayne ku kevirêk ji
kevirbûnê bêzar bibe ji nişkê ve xwe bike qirik û
qijik, ez eşkere bibêjim; MIN BI ÇAVÊN SERÊ XWE

DÎT û hêj zêdetir xuh û birano, MIN BI LENSÂ KAMERAYA XWE QEYD KIR! Ev cara duduyê bû ku min şahidiya veguherîna kevirên bircan kir û vê neqlê, li binya bircê, min kamerayek danî ser peyarêka jihevçûyî û ya Rebbî şikir, min karî vê metamorfoza zirecêb qeyd bikim. Heçî dixwazin wekî min bi çavê serê xwe şahidiya wê bikin, îşev saet nehê, vîdyoya qijikên jikevirçêbûyî, li ser profaylên xwe yên Youtube, Twitter, Instagramê û helbet li ser vê bloga xwe jî ez ê belav bikim. Heçî dibêje jixwe hemî giyanewer ji kevir û latên kosmosê çêbûne, vîdyoya te jî fotoşop e, bila bizane her cure xebat û lêkolîna teknîkî serbest e, ya derbar temam efektên hemî formatên vîdeoyan jî tê da. Ez hazir im, bila kerem bikin ka vîdyoya min kêşayî orjînal e yan fotoşop e.

Erê lê çima kevirên bircên me yên teqrîben çend hezar û niza'm çendik salî, xwe dikin qijik û terkediya dibin? Çend salan, pirs û pirsyaran min serê xwe bi vê meselê êşand, min gelek henekên dost û hevalan daqurtand ku ji min ra digotin "kevirên çi biraxulam, mejiyê te bûye qijik firiye,

zêde nevexwe”, ji binê red dikirin welê kevirek nivê
şevê bibe qijik. Dûr ji aqilan, min bizaniya ku çavên
min xiyanetê li mejiyê min dikin, dê min xwe
dînîtiyê danîba lê nexêr, kevirekî mezin yê bircê
wekî ‘elameteka qiyametê li ber ronahiya heyvê
bû qijik, ya Rebbî tu me bisitirînî, vîdyoya wê jî
heye.

Heçko serserebê vê sosretê ji bo min eşkere bû di
serî da. Erê, min başbaş nedizanî gelo rêya wê di
‘ilma biyolojiyê da heye ku kevir bibin xweyî ruh û
can, bask bi wan ve bîn, di dilqê qijikan da ber bi
asîmanan ve bifirin heta ji bînahiya çavan
derkevin. Îro jê êmin im ka tiştê min dîtî û qeyd kirî
çi ye. Ihtimal e wekî min serê pêşî texmîn kirî,
hişkesalî û xela ye sebebê koçberiya kevireqijikan.
Şetê Dîclê îroke ji dorhêla Cizîrê heta Bexdayê bi
temamî miçiqîbe jî li dora Amedê hêj qurtek av
maye. Hûn jî texmîn dikin ji ber zêdehiya
karbonmonoksîta planeta me ya yekane, fenanî
şet û behrên cîhanê îsal ne saleka dî illeh şetê me
dê ziwa bibe, zanyar welê dibêjin, ava heyatê ya li

teništa bajêr dixuşe, dê bimiçiqe. Dostên qenc û teqîbçiyên ku nivîsên min ên li ser vê bobelatê xwendine û bi rêya mesajan nîgeraniya xwe nivîsîne dê bînin bîra xwe ku miçiqîna Şetê Dîclê min wekî 'tofana nû ya Nebî Nûh' bi nav kiribû û çend fotografên kelek û gemiyên li biniya Birca Belek noqî avê bûne, li ser profaylên xwe yê hemî networkan min belav kiribûn, bi xem û kesereka edîbane. Jixwe di nûçeyên êvarê da divê we seyr kiribe. Niza'm hûn kengî çûne Hesenkeyfê û we halê bajêr dîtiye lê bawer bikin girîna kafiran pê tê. Bîst sal beriya niha xewwas diketin bin avê û ji wan xanî û şikeftên kevnar, celeb celeb tişt derdixistin, niha çolistaneka qedîm e. Cizîr jê dilsojtir e, Birca Belek bûye xirabeyê di dest bûm. Ji ber germê û hişkesaliyê, nifûsa bajêr maye pênc hezar. Behra Wanê bûye teştavê. Çola Urmîyê bi cendekên lawiran devedev teji ye. Li gor lêkolîna Rawest Research, li temamê Kurdistanê salane hezar û nehsed û bîst û sê çap 'erdê avî, hişk dibe. Gelo dor dora bajarê me ye?

Tirsa min ew tirs e rojekê bi temamî bimiçiqe û qedera Cizîra Botan ‘eyn dubare be ji bo Ameda me ya bêxweyî w xudan. Min digo fenanî berateyên li newalekê belkî li biniya Hewselê jî em cendekên kelek û qayîkan bibînin. Bifikirin ka Dîcle nebe Amed çî ye? Hema bêje di bin pirê da qurtek av xuya nake, ‘erda binê şetî ji ber hişkesaliyê tîştîştî ye, li bajêr di nav sûran da tu kes êdî dengê teyr û tiyuran, candar û lawiran seh nake. Havîn bûye yanzdeh heyv, zivistan nemaye. Deh salên dî binin ber çav û xêra xwe çend dilopkên hêstiran birijînin hêj ku kaniya çavên we jî nemiçiqiye.

Şikir ji Xudê qiyameta me ya piçkole hêj neqewimiye lê ‘elametên qiyametê zêde dibin. Ew tişta îşev hûn ê di vîdyoyê da seyr bikin, xirabtir e ji temam tofan û lehiyan ku ji ezel da niştecihên vî welatî gelek caran dîtine. Sebebê wê hişkesalî û germahiya planetê nebe, ku texmîna min a ewil ev e, ji xeynî zinakarî, xumar û ereqxuriyê pê ve tiştekanayê bîra min. Diyarbekir bûye bajarê gunehan, ne’ewzûbillah nifşekî bêedeb rabûye. Qey bajarê

me bûye qurbaniyê l'eneta Yezdanî? Hêj dudil im ji vê meselê ra bêjim mûcîze an bêjim 'elameta qiyametê. Lê mal bi mal dixwazim bigerim û ji sakinên Amedê ra bêjim; birano, xuhno, cîranno, axirzeman e, serdema bobelatan hat, sûrên me terka welat dikin, werin derd û keserên rojane bihêlin dera hanê, ka em bizanin mesele çî ye xêr e van kevîran berê xwe da rojava, ka rabin bikin hewar, em rê w çarekê bibînin da neçe ji destê me kembera zêrîn ya li dor newqa bajarê me, xilas bikin paytexta xwe ya nazdar, Diyarbekirê. Vî heqîr û jarê hanê tekane derd û xemxurî, kêmasî û qelsiyên welatê wî ye. Qenc dizanim dengê min naçe ber guhê rayedarên me yên sersar. Ma ne giyayê hewşê tehl e, em çî bêjin çî nebêjin qedrê gotinê nîne w qumaşê me xerîdarekî peyda nake, bi qewlê Xanî Baba. Emanet qencî, qîz û xortên Amedî. Îşev vîdyoya kevîreqijikan belav bikin, bila her kes bibîne ka ji ber hişkesaliyê, belkî jî ji ber van siyasetmedarên devşorbe û dewletliyan me yên kêrnehatî, bircên me bi çî terzî xwe dikin qijik, difirin diçin ber bi Oyroppayê ve.

IVOR PRICKETT: EZ BAWER NAKIM KU WÊNEYEK YAN WÊNEKAREK KARIBE BI SERÊ XWE PIR TIŞTAN BIGUHERÎNE

Fotografên berbijar yên Xelata World Press Photo ya sala 2020an belî bûn. Di nav berbijaran de, fotografekî ku şervanekî Kurd î birîndar û yara wî ya li serdana wî raber dike, heye. Fotograf di Cotmeha 2019an de, dema hêzên Kurdan û Tirkan pev diçûn, li Hesekê, bi kameraya Ivor Prickett hatiye girtin. Me ji Ivor Prickett ew wêneyê bo The New York Times hatiye girtin pirsî û wî bersivand.



Te ew şervanê Kurd yê 18 salî, Ahmed Îbrahîm berî yara wî dîtibû yan hûn tev ketin odeya wî ya li nexweşxaneyê? Çawa çêbû?

Gava ez cara pêşî ketim odeya Ahmed ew raketibû. Piştî demeke kin şiyar bû û rabû, çû lewabo. Dûre vegeŕiya hat ser cîhê xwe û pir derbaz nebû, yara wî hat nexweşxaneyê ku cara pêşî wî bibîne. Ji ber birînên Ahmed, yara wî pir xemgîn bûbû û ketibû şokê û her çiqas çend caran hewil dabû jî nikaribû biketa hindur odeya wî. Di dawîyê de îqna bû, ket hindur, destê Ahmed girt û bi çavên bi girî pê re xeber da. Di kêlîyên wisa de jiber girtina fotografan ez li xwe pir hêrs dibim. Lê Ahmed li min nihêrî û bo ez wê kêlîyê qeyd bikim hêdîka serê xwe leqand. Wek ku dizanibû nîşandana wê êşa wan çiqas girîng e. Min fotograf wisa girt. Bo min ew kêlîyeke sembolîk e û sermîyana şer ya li ser însanan raber dike. Konteksta li dor fotografan girîng e, lê mesaj bo temamê cîhanê ye. Şer tiştên ku nayên tarîfkirin bi însanan dikin û hêsîr dimînin li dû wan.

Te bo vî fotografi gotiye “Bêguman yek ji kêlîyên herî dilşikên yên heta niha min dîtine.” Gelo fotograf wê birînê dîsa bi xwîn dike gava tu lê dinêrî?

Belê gava ez lê dinêrim tesîreke giran li ser min çêdike. Çinku fotograf min dibe wê kêlîyê û wan hîsên wê çaxa ez li wir bûm tîne ser dilê min; ez di wî fotografi de wê êşa li wan gerîyayî dibînim. Bo kesên li wî fotografi dinêrin dibe ku ew ne tişteki berbiçav be, lê eger te şahidiya wê kêlîyê kiribe bi çavên xwe, ew hîn rasttir dibe.

Wênekar pir caran piştî fotografan digirin wan nîşanî kesên di fotografan de dikin. Piştî te ew fotograf girt, te xwest ku tu wê ji makîneya xwe nîşanî Ahmed Îbrahîm û yara wî bikî?

Ez fotografên ku digirim pir raberî kesî nakim. Fotografên zehf taybet yên ku kesên têde naxwazin werin naskirin ne têde elbet. Tenê, bo ez li wê derê bim destûrê dixwazim û karê xwe dikim.

Eger tu navekî li vî fotografê xwe bikî, wê çi be?

Ew pirseke zor e. Belkî “Tiştê Şer Dike” be.

***Li gor te, ew fotografên bi êş dikarin herbê
bisekinînin yan na?***

Bi ya min fotograf pir kêr daran dikare bûyereke diqewime rawestîne. Ez bi xwe bi vê hêvîyê naçim herêmên herbê, çinku ger ne wisa bûya wê xeyalên min pir zû bişikestana. Fotograf dikarin sermîyana şer ya li ser însanan bi bîra însanan xin û wek belgeyê kiryarên şaş bimînin. Ez bawer nakim ku wêneyek yan wênekarek karibe bi serê xwe pir tiştan biguherîne, lê belkî em bi hev re karibin hin tiştan biguherînin.



Ivor Prickett ji 2009an vir ve bûyerên li Rojhilata Navîn dişopîne. Di sala 2019an de bi navê “Dawîya Xîlafetê” kitêbeke wî derketiye.

PUROYA CHURCHILL Û MÊRDÎNÎYEKÎ OTTOWAYÎ

Ferit Fikret

Serokwezîrê Brîtanya Winston Churchill yê ku di Gulana 1940ê de dema li meqamê xwe rûniştibû ji gelê xwe re gotibû “Ez xêncî xwîn, zehmetî, hêsir û xwêdanê soza tişteki nadim we” û nehiştibû Nazîyên Almanya yê piraniya Ewropa bi dest xwe xistibûn welatê wî bixin bin hikmê xwe, di Berfanbara 1941an de bo spasîya hevalbendên xwe yê di Herba Cîhanê ya Duduyan de bike, piştî Amerîka, serdana Kanadayê kir. Churchill, kumê wî li serê wî, di devê wî de puro, di destê çepê de gopal, tilîyên wî yê zaferê yê destê rastê li jor, di nav qelebelixê re derbazî parlamana Ottawa ya li paytexta Kanada bû. Wî di axaftina xwe de da zanîn ku ewê hevkarîya bi hevalbendên xwe re bidomînin û serî li ber rêberên Japonya, Îtalya û Almanya netewînin. Parlamenterên Kanada yê ku ji gotinên Churchill hêz û feyz hilgirtin, di dawîya axaftina dîplomatê dêrîn de rabûn ser xwe û ji wî re li ser nigan çepik lêxistin. Piştî merasîma li parlamana, Serokwezîrê Kanada Mackenzie King,

Churchill û berdestên wan tev derbazî jûra taybet bûn. Churchill ku di odeya taybet de makîneya fotografan û ekîpmanên mezin yê bo ronahîyê dîtin aciz bû û bi qehr got “Ew çi ye? We çima berê ji min re negot?” Mazubanê malê Mackenzie King jî di nav de ti kesî newêribû dengê xwe bikira. Churchill di ser hêrsa xwe re puroyeke teze vexist û ji wênekar re got “Tu dikarî fotografekî bigirî” Wênekare ku King Mackenzie bo girtina wêneyên dîplomatan ji derve dihatin welatê wan wazîfedar kiribû dizanibû ku berê bi sedan fotografan Churchill yê bi tilîyên zaferê û bi puro hene û wî dixwest bi destûra bo tek fotografekî hatiye dayîn pozeke cuda bigire. Loma, wênekar berê here ber makîne û ekîpmanên xwe yê ku ji şev de hazir kiribû, xwelîdankek dirêjî ber Churchill kir ku ew puroya xwe vemirîne, lê serokwezîrê hêrsbûyî red kir û kufeke din li puroya xwe xist. Li ser vê redkirinê, wênekar li ber devê Churchill sekinî, got “Bibexşîne mîrê min”, puro bi wêrekî ji devê wî kaş kir û hema çû ber kameraya xwe û rûyê Churchill bi hêrsa wî ya qatekî din zêde bûbû girt.



Fotografekî efsanewî yê rêberekî efsanewî yê bi destê wênekarekî efsanewî hatibû girtin, wê rojê bi xwe re çîrokeke efsanewî jî çêkiribû wisa. Çêkerê wê kêlîya bi pir-efsane Yousuf Karsh bû.

Yousuf Karsh yê ku yek ji wênekarên portreyan yên herî rind yên sedsala 20an tê qebûlkirin di 1908an de li Mêrdîn ya wan salan di bin hikmê Dewleta Osmanî de bû hatiye dinê. Dê û bavê wî yê Ermenî, jiber zordestiyên li ser wan di sala 1921an de zarokên xwe rakirine û bi karwaneke Kurdan re berê xwe dane Sûriyê. Piştî çar salên li Sûriyê, xalê Yousuf yê li Kanada, George Nakash yê wênekar ji dîya wî re nameyek şandiye û gotiye ku “Xwarzîyê min bide ber destê min, bila bibe şagirtê min û karekî bielime” Li ser vê xwestinê, dê û bavê Yousuf destûr dane û ew xortê 17 salî ji Helebê çûye Beyrutê û ji wir bi gemiyê di 29 rojan de derbazî Quebec ya Kanada bûye. Hema piştî demeke kin Xalê George kamereke Brownie ya Kodak daye destê Yousufê Xwarzê û xwestiye ew jî xwe li fotografan biceribîne. Yousuf li pey hev fotograf girtine û hin ji wan fotografên çapkirî li hevalên xwe yên nû yên li Quebec belav kirine. Hevalekî Yousuf, fotografekî wî yê ku têde zarokên li ser mêrgekê dilizîn hebûne, bêyî haya kesî pê xîne ji pêşbazîyeke fotografan re şandiye.

Dema Yousuf elimîye ku wî bi fotografê xwe di pêşbazîyê de xelata bi 50 dolar qezenc kiriye şok bûye û fehm kiriye ku ew dikare bi fotografan pereyên pir qezenc bike. George yê hoste jî bi fotografên din şiyana di Yosuf yê şargirt de ferq kiriye û bo ew xwe pêşdetir bibe şandiye ber destê wênekarê portreyan John Garo yê li Amerîka.



Yousuf Karsh û John Garo, 1930

George, xwarzîye xwe Yousuf bo 6 mehan şandîye ber destê John Garo lê ew ji 1928an heta 1931an, li Bostonê ber destê hostayê xwe yê nû xebitîye û bi taybetî teknîkên fotografan ji wî elimîye. John Garo hin caran ji berdestê xwe xwestîye ku wî teqlîd neke û bi perspektîfên cuda wêneyan bigire. Yousuf bi demê re stîla xwe çêkiriye û di sala 1932yan de vegeşîyaye Ouebec ya Kanada û di serwir re jî çûye li Ottawa ya paytext bi cîh bûye. Yousuf li wê derê bi navê Karsh of Ottawa (Karshê Ottowayî) fotografxaneyek vekiriye. Berî ew veke li Ottawa 12 fotografxaneyên din hebûne, lê hunera wî ya fotografan hema deng daye û roj bi roj mişterîyên wî yê payabilind zêde bûne û ew bi hunera wênekariya xwe bi rayedarên dewleta Kanada re jî rabûye rûniştîye û di sala 1936an de bûye wênekare hikûmetê. Heta Berfanbara 1941an de tevî ku wî wêneyên birek serok û rêberan girtine jî, wêneyê Churchill deng vedaye û jîyana wî guherandiye. Ew wêne berê di Saturday Night de derketîye û piştê Kovara Life bo wî wêneyî li bergê xwe deyne 100 dolar daye.

Yousuf Karsh navê wî wêneyê “Şêrê Dihirmije” daniye. Li gor gotina Yousuf Karsh, piştî wêneyê pêşî Churchill li ser wêrekîya wî bişirîye, bo fotografekî destûr daye û dûre gotiye ku “Tu dikarî şêrekî dihirmije jî bo fotografan bisekininî”



*Têbînîya Edîtor: Malpera wêneyên Yousuf Karsh www.karsh.org destûr da em berhemên wî bi vê nivîsê re biweşînin; spasîyên taybet bo wan.



New York - Adar 2020 Foto: Arina Voronova